

**Ji bo dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê**

29.03.2021

**Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser xebata lênêrîna zarokan a piştî
29ê Adara 2021an
(bi agahiyên temamker ên ji 31.03.2021an)**

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

her çiças gelek tedbîrên cûrbicûr ên ji bo pêkanîna xizmeteke lênêrîna zarokan a domdar û ewle hebin jî, hejmara pêkhatinên enfeksiyonê her wisa li navendên lênêrîna zarokan ên Berlinê her bêhtir dibe, ku ji ber vê sedemê bi berdewamî her bêhtir hêlîn bi giştî yan jî tenê beşek jê tên giritin. Di heman demê de her wisa li Berlinê jî hejmara zarokên bi vê nexweşiyê dikevin bêhtir dibe. Ji ber vê yekê em ji we rica dikin, ku bi berdewamî teqez bi qasî ku pêwîst e, hûn ewqas sûdê ji xizmeta lênêrîna bigirin û di derbarê vê mijarê de bi rêkûpêk li gel hêlîna xwe biaxivin.

Wekî din ev rêbaz pêk tên:

- **Xebata asayî ya berbisînorkirî berdewam e.** Divê lînêrîna zarokan bi qasî, ku pêkan e, di komên neguherbar de pêk were. Gava ev yek ji ber sedemên organîzekirinê ango yên xebatkaran ne pêkan be, hingê çarçoweya xizmeta lînêrînê dikare were berbisînorkirin.
- **Zarokên nîşaneyên sermagirtinê bi wan re hebin, nikarin sûdê ji lînêrînê bigirin.** Ev tedbîrên ewlehiyê yên demkî tîn standin, ji ber ku hejmara enfeksiyonên koronayê yên zarokên di temenê hêlîna zarokan de ne her bêhtir dibe. Ev yek her wisa ji bo zarokên dikuxin, zekemî ketine yan jî agirê wan heye jî derbas dibe. Gava nîşaneyên sermagirtinê hebin, ku ji aliyê doktorî ve hatine zelalkirin, bo nîmûne bertekên alerjîk ên wekî zekemiya kulîlkan û hwd, zarokê/a we dikare helbet berdewamî sûdê ji lînêrîna zarokan bigire.
- Wekî alternatîv hûn dikarin bi zarokê xwe re testa-zû/testa-xweser li malê bikin û xwedaxiuyaniyeke di derbarê encama negatîv a testê radestî hêlîna zarokan bikin. Gava ji aliyê organîzasyonê ve pêkan be, dêûbav dikarin testa xweser bi serê xwe bi kar bînin. Texmînî ji nivê meha Nîsanê û wir ve **testên xweser ên ji bo zarokan** dê radestî hêlînên zarokan werin kirin.
- Wekî din derfeta we heye, ku hûn di derbarê testê de xwe bigihînin doktoreke zarok û ciwanan/ doktorekî zarok û ciwanan. Ji ber ku tenê hin muayenexaneyên doktoran test dikin an jî belgeyeke li ser vê yekê didin, loma yekser pêşniyar dikin, ku hûn di pêşî de bi muayenexaneyê re bikevin têkiliyê.
- Ji bo ku zarokê/a bikaribe piştî navberekê dîsa here hêlîna zarokan, pêwîst e, ku ew bê nîşaneyên nexweşiyê be. Nivîsa tenduristbûnê ango „Gesundschreibung“ an jî testeke nû ne pêwîst e.
- **Destûra xebatkarên perwerdehiyê êdî heye, ku maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî her wisa di dema têkiliya rasterast a bi zarokan re jî bi kar bînin.** Di dema têkiliya rasterast a di navbera mezinan de mecbûrî ye, ku ew maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî bi kar bînin. Tenê gava belgeyeke ji aliyê doktorî ve were pêşkêşkirin, hingê ji bo bikarnenanîna maskeyên tîbbî yên ji bo dev û rûyî îstîsna dikare were kirin.

Her wisa bi riya pêşkêşkirina derziyan a ji bo xebatkarên hêlînên zarokan û xizmeta berdewamî ya radestkirina testên zû xizmeteke domdar a hêlînên zarokan pêkan bûye. Ji ber ku niha zarokên biçûk jî her bêhtir bi nexweşiyê dikevin, loma kêmkirina pêwendiyên û şopandina pêwendiyên pêkhatî gelek girîng in. Ji ber vê yekê em bi domdarî dixwazin, ku hûn her wisa derdora xwe ya şexsî jî bifikirin.

Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hêjî bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an heta 15an xwe bigihîninê (ji bilî 01.04.2021).

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk